# Kurdistan

Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin

PDK-S 1957

Rojnamakurdistan.com | Kurdistan-Hejmar (268) | Gulan / 01-05-2024


# «Pêwîste êrîşên ser ofîs û partiyên siyasî werin rawestandin»




Kurdistan

Emîndariya Giştî ya Encumena Niştîmaniya Kurdî li Sûriyê ENKS daxuyaniyek derbarê şewtandina ofîsên Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya PDK-S û Partiya Yekîtiya Demokrata Kurdistanê belav kir û têde ragihand, çekdarên ser bi PYD ve roja 24 Nîsanê ofîsên Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya PDK-S û Partiya Yekîtiya Demokrata Kurdistanê li bajarê Qamişlo şewitandin û kelûpelên di nav wan de hemû şewitîn, hevdem hewil dan ofîsa Encumena Niştîmaniya Kurdî li bajarokê Tirbesipiyê bişewitînin, û ev yek nîşaneya wê yekê ye ku ev kiryar pilankirî ne.

> **«Divê encamderê van kiryaran werin sizadan»**

Encumena Niştîmaniya Kurdî li Sûriyê ev kiryar şermezar kirin, û daxwaz ji rêxistinên civaka sivîl, rêxistinên yasayî û Hevpeymaniya Navdewletî di serî de Emerîka bi berpirsyaretiya xwe rabin ji bo rawestandina van kiriyan.  Balyozxaneya Emerîka li Sûriyê roja 25ê Nîsanê peyamek li ser torên civakî belav kir û têde ragehandiye, “Em şewitandina ofîsa Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya PDK-S li Qamişlo şermezar dikin”.

Balyozxaneya Emerîka li Sûriyê amaje jî daye, “Divê êrîşên li ser ofîs û partiyên siyasî li bakurê Sûriyê bên rawestandin û lêpirsîn jî bi bikerên wê rûdanê re bê kirin”.

> **«Kiryarên dijî ofîsan têne kirin pilankirî ne»**

Balyozxaneya Emerîka li Sûriyê di wê peyama xwe de herwiha daxwaz ji hemî aliyan kiriye ku ji bo bicihanîna daxwazên xelkê Sûriyê dûr ji tundûtîjiyê pabendî gotara aramcder bin”.

## PDK-S «Kampa Barzanî» ji bo pêşxistina karînên endamên xwe lidar xist

Kurdistan

Ofîsa Pêwendiyên Niştîmanî ya Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya li Herêma Kurdistanê xula yekem ya “Kampa Barzanî” ji endamên  xwe re li devera Barzan lidar dixe, di çarçoveya pêşxistina karînên ciwanan di warê siyasî û rewşnebîrî de.

Ev kamp hejmareke çalakiyên cor bi cor li xwe digre ku armanc jê geşedana karîn û behreyên endaman e, û zincîreyeke semînar û waneyên siyasî, dîrok û rewşenbîrî têne dan, bi armanca berfirehbûna asoyên beşdaran û zêdekirina têgihiştina wan di dosyên giring de.

Herwiha kamp hejmareke çalakiyên werzişî û rengîn li xwe digre, ku armanc jê bihêzkirina rewanê yek tîmî û aktîvbûna civakî di nava endaman de, jibilî vê yekê di çarçoveya kampê de dê serdana mezarê nemiran û cihên şûnewarî li devera Barzan bê kirin, ji bo bihêzkirina têgihiştin û têkiliya bi kelepûr û dîroka Kurdî re.

Derbarê “Kampa Barzanî”, Endamê Mekteba Siyasî  û Berpirsê Ofîsa Pêwendiyên Niştîmanî ya Partiya Demokrata Kurdistan- Sûriya Seîd Omer ji Rojnameya Kurdistan re ragihand, armanc ji rêkxistina vê kampê bihêzkirina karînên ciwanên partiyê ye, û handana wan ji bo beşdariya aktîv di rêxistinên PDK-S û karê hevbeş e. Seîd Omer tekez kir, kesên beşdar di kampê de nûneratiya endam û kadirên rêxistinên PDK-S li Herêma Kurdistanê dikin, herwiha giringiya sûdwergirtina wan ji van çalakiyan destnîşan kir, ji bo pêkanîna armancan bi mebesta pêşxistina karînên ciwanan. Hêjeye gotinê, biryar e di demên bê de xulên nû bêne vekirin heta ku tevahiya endam û kadirên PDK-S beşdariyê bikin.






**Zêdetir bixwîne...**

**Efrîn.. Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî projeya Ezîzan ragihand** *Rûpel—3*

**Romana «Zabêl Ez Ermenî Me» hat çapkirin** *Rûpel—4*

# Rewşa Bazarên gelêrî li Kurdistana Sûriyê





Hêvî Delî- Qamişlo

Di berdewamiya kirîza Aborî û mirovî li Sûriya bi tevayî, nexasim li Rojavayî kurdistanê bi taybetî her ku diçe aloztir dibe, tê wateya ku piştî 13 salan ji şerê navxweyî bi awayekî rasterast hiştiye ku miletê Sûriyê rastî pirsgirêk û rûbirûyî jiyaneke bibandor di hemû warên jiyanê de ji aliyê qeyrana aborî, birçîbûn, metirsî, bêkariyê,nearamî,

> «Rewşa abûriya xelkê gelekî xerab e»

binpêkirinên tund de derbas bibe, di encamê de ev yek dihêle ku rewşa aborî bibe sedema sereke ji hejariya welatiyan li seranserî Sûriyê bi giştî bê guman dubarkirina bilindbûna berdewan a nirxan weku kerestên xwarinê, derman, embêrên elketrîkê piştî zêdetirî Sê mehan ji birîna kerebaya Niştîmanî bi timamî li ser Herêmên Kurdî, û herwiha têkçûna binesazî û xizmetguzariyên din ê sereke ên pêwîst yên jiyanê, dibin cihê nerazîbûna hemwelatiyên dever, ji aliyekî din ve bilindbûn û guhartina berdewam a nirxê dolarên Emerîkî li hember lêreya Sûrî ev yêk bandoreke neyînî û bargiraniyekê zêde li ser jiyankirina welatiyan çê dike ji bo gihiştina bidestxistina xizmetên bingehîn nexasim bandora wê li ser kirîn û firotinê di nava bazarê de dike, ji ber vê yekê Li herêmên kurdî li Kurdistana sûriyê, her roj di heftiyê de bazarên demkî ku bi bazarên gelêrî tê naskirin li tax û bajarên Kurdî tên danîn û nexasim piştî bilind bûna nirxê hemû pêdewistiyan li bazara bajêr êdî hejmara xelkê li va sûkan zêde dibe. Di derbarî nirxê hemû alavan û liv û tevgera hemwelatiyan di nava bazarên gerok de li Rojavayê Kurdistanê de bi çi awayî ye. Ku li ser vê mijarê firoşkarek ku nava bazara demkî de Kar dike, bi zelalî behsa dîroka wê dike ji rojnameya Kurdistan re: Ku bazarên demkî, ew bi bazarên gelêrî ango bi bazarên gerok tên naskirin di nava herêmên kurdî li Kurdistana Sûriyê li cihên cuda û berfieh de têne danîn, ku her roj di heftiyê de ev bazar ji taxakê bo taxaka din tên veguhastin û navê xwe ji navê roja ku ew têde tê li darxistin wergirtiye, û tevlîheviyeke baş di van bazaran de em dibînin û çêdibe û tevgera xelkê ji pir çalak dibe, nexasim piştî bûhabûna nirxan de ku her kes seredana va sûka dikin ji destpêka rojê de û bi taybet Jin ji ber hebûna piraniya pêwestiyên mal pê hewcedar bê ku dikarin bikrin bi nirxekî erzantir ji sûka mezin de ku hemû alavên malan têde peyda dibin, herwiha berdewam kir gotina xwe ku Bazarên gêlerî ji bo gelek malbatên hejar re ji çavkaniyek aborî ya baş e, ji ber ku firoşkar kelûpelan bi rêjeyeke mezin tînin û bi buhayekî erzantir li gorî buhayê heman kelûpelan ên li bazaraên bajêr difiroşin û ji aliyekî din ve ev bazar pêdiviyên gelek malan peyda dike û ne tenê xelkê taxê lê navçeyên derdora bajar jî serdana va bazaran dikin. Û ji rexekî din ve di çarçoveya vê babetê de welatiyeke Jin ji Qamişlo di nava bazara Pênçşemê de ji Rojnameya Kurdistan re di vê mijarê de ragihand û anî ziman : ku mirov neçar dibe her roj berê xwe bide nava bazarê de ku pêdewistî û pêdeviyên xwe ji xwarinê û şînahiyê rojana bi dest bixe, û berdewam kir piştî vê kirîza aborî ya li Sûriyê hatî rûdan û her tişt buhabûye ji vê yekê em berê xwe didin bazarên gerok da ku xwestekên malê bibûheyekî erzantir peyda bikin ji ber ku ew hejarin û dahata wan ya mehana têre wan nake êdî zehmetiyan dikşînin di debara jiyana xwe ya rojana de. hêjaya were gotin ku dema mirov derbasî nava ve sûkan dibe tevlîheviyeke dibîne ji aliyê belavbûna cûreyan ji firaxan û şînahî û cil û bergan, û her bazirganiyek konek Yan otombîla xwe kiriye cihê ku bazarê têde bike û li her deverekî di herêmên Kurdî de li Kurdistana sûriyê tên danîn wekî bajarê Qamişlo, Çilaxa, Amûdê, Tirpespiyê, û navê ve sûkên gelêrî li gorî roja têde tên danîn di heftiyê tê kirin.

> «Divê rewşa xelkê baş bibe û kelûpel werin erzan kirin»

# Kurdistan.. Bûkxatûna rojnamegeriya Kurdî



Ebdilbaqî Elî

Wek berhem û semyanê çend sal xebat û tekoşîn bûk xatûna Berdirxaniyan bi xemlek botanî, bi dêmên qeşeng, riwê beşûş û devliken serî hildide, pencere belê dergehên Kurdayetiyê li çar kenar û seranserê Kurdistanê vedike, bayê hênik yê buhara zozanên cizîrê li her Kurdekî Kurdperwer diweşîne. Ava zelal û qerisî di germiya havîna bendewariyê de bi gewdê Kurdên tiyê azadiyê de berdide. Mîrê Cizîra Botan Miqdad Midhet Bedirxan piştî çend hewlên nebiserketî, yên ku di riya çand û rojnamegeriya Kurdî de şikerst anî neçar ma ku hewlên xwe veguhêze cihekî dî, ew hewldan li bajarê Qahîra paytexta Misrê berhem aniye û berî sed û bîst û şeş salan di sala 1898an de bingeha rojnamegeriya Kurdî damezirandiye. Digel ku rojnameya Kurdistan di jîngeheke biyanî de û ji derveyî sînor û axa Kurdistanê derketiye, lê bi navê xwe yê xweş û bi zar û zimanê xwe yê şêrîn ji malzaroka doza Kurdî derketiye, kul, derd û azarên gelê Kurd belav kiriye, dilê Kurdan li her cihî xweş kiriye, wek sitêreke geş belê wek heyv û rojê li ezmanê Kurdistanê hilatiye, tîrêjên xwe yê geş bi ser xaka Kurdistanê de berdaye.

Rojnameya Kurdistan dibe çavkaniya rojnamegeriya Kurdî, çem û rûbarê rojnamegeriya Kurdî jê derdikeve, û diherike ku bi demê re çendîn cok û cobr jî xwe lê digirin û dikevin nava pêl û şepêlên wê de.

Rojnameya Kurdistan dibe motika rojnamegeriya Kurdî, dibe mak û dayika rojnamegeriya Kurdî, ji zikê Kurdistanê çendîn çêlîk û zarok hatine der, wek ( Hawar, Ronahî ,…) Ji koka Kurdistanê çendîn şax û çiqil kat dane, li ser rêç û şopa Kurdistanê çendîn govar û rojname di esmanê rojnamegeriya Kurdî de hilatine û serî hildane, wek Rojnameya Kurdistan ya Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya PDK-S ku nîv mihane tê çapkirin û derxistin li ser wê rêçê ye û heman nameya Kurdayetî hildigire, pênasîna kêşe û Doza Kurdî li Sûriya û belavkirina wê girtiye ber xwe. Dîroka rojnamegeriya Kurdî bi hejmara Govar, rojname, malper, dezgeh û alavên ragihandinê zengîne, hin ji wan hene ku di riya xwe de berdewam in û hin jî di rê de rawestihane, lê ked û mîrasa wan di vê dîrokê de xuya berçav e.

Lê pirsa ku xwe tîne ser ziman ew e ku piştî sed û bîst û şeş salan ji derçûa rojnama Kurdistan rojnamegeriya Kurdî di çi astê de ye? Rola rojnamegeriya Kurdî çiye?, cihê wê di nav alav û dezgehên ragihandina nûjen û modêrin li ku ye?. Gelo rojnamegeriya Kurdî kariye xwe bigihîne karwanê ragihandina serdemê û pêre bilive, ango li gor alav û pêdiviyên ragihandinê xwe nûjen bike?.

# Roja Rojnamegeriya Kurdî li Efrînê hat pîrozkirin

Kurdistan

Bi boneya 126emîn Roja Rojnemegeriya Kurdî, rêxistina Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya PDK-Sê li Efrînê, çalakiyek encam da. Di çalakiyê de, behsa rojnemeya Kurdistan û rola wê û zehmetiyên li pêş rojnamegeriya Kurdî hate kirin. Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriye PDK-S, 126mîn salvegera belavbûna yekemîn rojnameya Kurdî, li bajarê Efrînê bi çalakiyekê bibîr anî. Nûner û alîgirên ENKSê, rojnemevan û rewşenbîrên bajarê Efrînê beşdarî çalakiya PDK-Sê bûn. Di çalakiyê de, gotar hatin xwendin û amaje bi giringiya rojnemegeriya Kurdî, rola wê û zehmetiyên li pêş rojnamegeriya Kurdî hate kirin. Herwiha hejmarek komên folklorî yên Kurdî beşdar bûn, sema û lîstikên xwe pêşkêş kirin û govend û dîlanên Kurdî gerandin. Li Kurdistana Sûriyê salane di 22ê Nîsanê de, Roja Rojnemegeriya Kurdî ji aliyên partiyên siyasî, sazî û rêxistinên çandî û rojnemevanan ve tê bibîranîn û hin çalakî bi vê boneyê têne lidarxistin.





**Roja Rojnamegeriya Kurdî**

Roja Rojnamegeriya Kurdî, roja bîranîna derketina rojnameya pêşîn a Kurdî ya bi navê Kurdistan e. Rojname di 22ê Nîsana 1898an de ji aliyê Miqdat Mîthad Bedirxan ve bo yekem car li paytexta Misirê Qahîrê hatiye çapkirin. Bi helkefta vê rojê, di roja 22ê Nîsanê de Roja Rojnamegeriya Kurdî tê pîrozkirin.

# Efrîn.. Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî projeya Ezîzan ragihand

Kurdistan

Projeya Ezîzan, projeyeke din a Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî li bajarê Efrînê ye, ku bi rêya wê projeyê alîkariyê bi jinên bî û zarokên sêwê re dike.

Di qonaxa yekem de, Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî alîkariya 108 malbatan li Efrînê dike û di qunaxên bê de jî, destpêşxeriya ezîzan berfirehtir dibe.

Ji heyama saleke ve, tîma Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî serdana wan malbatan kiriye û hemû belgename kom kirine û alîkariyan li ser wan zarokan belav dike. Li Efrînê û ji ber rewşa ku tê re derbas dibe, gelek malbat bê semyan mane, ji ber wê yekê Projeya Ezîzan a Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî ya dawî giring e û bi taybetî ku barê malbatan sivik dike û jiyaneke bi rûmet ji zarokan re peyda dike. Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî ku ji erdheja



sibata 2023an ve derbasî bajarê Efrînê bûye, tekane dezgeh e ku alîkariya mirovî û piştgiriya derûnî pêşkêşî xelkê bajêr dike herwiha çalakiyên cur bi cur ji zarokan re birêve dibe.

# Romana «Zabêl Ez Ermenî Me» hat çapkirin



Kurdistan

Nivîskar Ezîz Xemcivîn romaneke nû ya bi navê “Zabêl Ez Ermenî Me” li ser trajediya ku hatiye serê miletê Ermenan nivîsandiye. Romana ‘Zabêl Ez Ermenî Me”, romana duyemîn a nivîskar Ezîz Xemcivîn e û ji aliyê Weşanxaneya Sîtav ve hatiye çapkirin. Kevala bergê pirtûkê jî ji aliyê şêwekar Luqman Ehmed ve hatiye dîzaynkirin. Nivîskar Ezîz Xemcivîn derbarê vê berhema xwe de wiha dibêje:
“Naveroka romanê li ser jiyana kesayetiyeka Ermenî ye, ew kesê ku bi navê Serkîsê Kêvo ye ku di salên fermanê de 9-10 salî bû. Ji ber ku ferman li miletê wî rabûye, xwe li cihekî veşartibû, zilamekî Kurd ewî dibîne, li ser hespê xwe bi berbangê re direvîne tako ewî bigehîne sînorekî, lê bi mixabinî ve dikevin dehfika dijminan. Ew mêrê Kurd tête kuştin û ji Serkîs re dibêje bireve û xwe bigihîne qeflekê xwe rizgar bike. Roman trajediya ku hatiye serê miletê Ermenî û ew bûyerên ku çêbûne dinimîne. Serkîsê Kêvo yek ji du milyonek Ermenî perîşan, derbider, kuştî û windayî ku li jêr stema dewleta Osmanî û çeteyên wê derd kêşandiye, an yên ko tune bûne û nemane”.
Nivîskar Ezîz Xemcivîn diyar dike”Di Romana Zabêl Ez Ermenî Me, bi dehan çîrok û serpêhatiyên balkêş hene. Bûyerên romanê jî ji gelek herêmên curbicur hatine hûnandin. Ev sê sal in ez kar li ser vê romanê dikim. Nivîsandina romana belgehî, ji karên din zehmettir e, anku nivîsandina biografiya ne wek ku tu tiştekî ji hizra xwe binivîsînî ye, ji ber ku bûyerên hene bi dîrokê ve girêdayî ye û hûrbînî gelek jê re divê, bi taybet naverok û dîroka bûyerên romanê vedigere sala 1915an û bi şûn de, dema ku fermana Emeniyan hatiye dayîn û pêwîstî bi gelek jêderan jî heye”.




Ezîz Xemcivîn kî ye?
Li bajarê Hesekê yê Kurdistana Sûriyê jidayik bûye. Sala 1982an dest bi nivîsandina helbestê kiriye, heta niha gelek berhemên wî wêjeyî di warê helbest, alfebêya Kurdî û lêkolînê de hene. Herwiha sala 2019an jî romana xwe ya yekem bi navê “Zêro” çap kiribû.

## Serkeftin(Kurteçîrok)



Nehro Goranî

Kurdistan

Birê Memo van çend rojin, ji hemî rêya tirmbêl tuj î mirovin bi ser herêma ma va tên, zarok, kal, pîr
Herêma me ji kesên biyan tuj î bû,
Erê weleh roj rojê hejmara me, kurdên resen hindik dibin, ne tenê yên biyan tên, hîna rêya çiyayê xewna vekirin û miletê me yê kurd ji mala derdixin û di wê rêyê re koç dibin, kuva dibin kes nizane?
Tenê em zanbin bervê miletê me li kuye?
Çi dibe?
Birê Hozan tiştê tê xuyan, pilan mezin e, lê miletê meyî perîşna hajê nîne
Pir alî di pilanê de alîkarin, her beşek bi rolek radibe di talankirina gelê me de.
Şer bû û niha divê milet vegere Gundê xwe, vegere nav zevî û malên xwe, ji bo çi ji herêm biderdixînin
Berê milet berve deverin din dibin.
Dibin çol û beybana.
La birê Memo: karê van bazirganiyê bi miletê me bikin, vaye ji deh salan de bazirganiya xwe bi canê keç û xortên me dikin, bi xwîna miletê me bazirganiya xwe dikin.
Îro jî şêweyekî din, êkê berjewndiyê xwe bidomînin, ew wek jê tê xwestin dikin, li paş van hêzin nepend hene rêjîmin stemkar.
Hîna ev hêzên bi dagîrkera re hatine dest bi talanê û diziyê kirine, tişt nehêşt, çi tê ber destên wan didizin û talan dikin, ev wek Kuliyane, kulî ger herin kîjan deverê tîştî nahêlin,
Birê Hozan: evina ji destpêka dîrokê, va karî dikin, dizî, talankirin, di qonaxa borî de di bin sîwana îslamê û rêzgariyê , ger bigihîştina kîjan herêmê ne dar, ne kevir dihêştin, hîna keç û jin ji xwe re kola dibirin, û bazirganî bi wan dikirin, dikirîn difirotin, , dîroka van bi xwîna miletê derdorî xwe ava bûye, xwe li ser terimên miletên din avakirine, pir şer bi hev re jî kirin. bi canê hev ketine, hev jî talan kirine, hev kuştine, jinên hev revandine.
Ev karê vane.
Birê Memo:
Ma ji bo çi em herdem loma ji dijimin dikin,
Carekê divê em li xwe vegerin, par me di bindestiya me de çiye?
Divê em loma ji xwe bikin, carekê li serê xwe xin. em jî berpirsiyarin di ber de, ta roja îro em bindestin, ev bobelatên tên serê me, ma para me çiya?
Divê em bi mêjîyekî berfereh werin ber doza xwe, sedem çine?
Em bûne lîstik bi dest dijimin de
Ger em gihîştin sedemên van xala, me şaştiyê xwe dîtin. emê nîvê pirsgirêka xwe nasbikin, divê em li mejîyê xwe vegerin li ramanên xwe, alozîk di mejiyê me de heye, emê van xala çareser bikin,
Birê Hozan em tev xwe zana û zîrek dibînin, karê ne karê me em destê  xwe dikinê, divê her kes li gorî asta xwendina xwe û zanebûnê kar bike.
Her kes di karê xwe yî pispor de bi serdikefe û baweriya wî bi wê karî, em xwe dikin her karekî, rêveberiya mileta ne hêsane, divê yek bixwîne û di astek bilind dabe xudî ezimûn be,
Gudarî hevalê xwe bike, wê hîngê emê nêzîk î çareseriya doza xwe bin.
Birê Hozan ev xalên te dest nîşankirin emê çewa bigihînên
Birê Memo: pir hêsane, ger em li xwe vegerin û bi bawerî ji doza xwe re kar bin.loma ji xwe bikin
Bi temî û şîretên zana yê xwe mîna Ehmedê Xanî, cizîrî...
Bikin
Şaştiyê xwe ragihînin
Ev bi xwe dilêrî gerekê meye,
Ma em tev ne berpisiyarin ji ber va guhartinê li herêma çiyayê kurmênc û waşokan dibe
Belê em tev alîkar bûn, ji ber em ji mal û zeviyên xwe bi dûrketin, ew stubariya me gişta bû.
Ew jî nezaniyê hatiye, divê em nifişekî nuh perwerdekin, bi xwendinê û baweriya wan bi ax û doza wan hebe.
Bira, miletê cîhan te rêzgar bû ne bi hêsan î, û roj û şevekê de,
Rêberekî dest bi kar û xebata xwe kir û ramana xwe gihand dost û hevalên, tev gihîştin bawerîkê bi hev re alîkar bûn, bi serkeftin.
Wek tê zanîn, çem û deriya ji dilopên baranê bi hev dikevin.
Ez bawerim ku miletê, baweriya xwe bi ax û hebûna xwe heye, tevî zordarîya li ser li dawiyê ê rêzgar be û azadî para wan e.